Udîpûs û Sifînks (Sphinx)

Cankurd, 23. Januar 2012

Yek ji efsaneyên cîhanî yên navdar û temenê wê ne kêmtir e ji 3000 sal, efsaneya Odîpûs e, ku bi piraniya zimanên şaristanî hatiye nivîsandin an wergerandin. Ta niha bi cîh bûye, ku ji 2500 sal de, ev efsane, bi şêweyekî nivîskî di deftera çandî ya mirovatiyê de heye. Di vê efsaneyê de jî, sira jinekê diyar e, wekî di hemî efsaneyên ku me div ê pirtûkê de ji we re bi Kurdî, kurt û kin, amade kirine.

Çi hebû, çi tun bû

Berî niha bi hezaran sal, li bajêrê Dêlfî (Delphî), pîrejineka ku ji mirovan re paşeroja wan dixund û bi wê yekê gelek navdar bûbû, hemî padişah, serleşker, pîrên olî û cadobaz ji wê ditirsîn, û bo dilxweşkirina wê, jê re pir qurbaniyên mezin didan, ji padişahê Têbê re, ku bi navê Layos bû, rojekê got, ku ewê bi destê kurê xwe bite kuştin, paş ku ji jina wî Lokaste kurek ji wî re pêda bibe.

Demek derbas bû, jina padişahê xemgîn kurek hanî. Bi fermana wî, pêyên mindal, ê ku taze rohniya cîhanê dîtiye, hatin qulkirin, û ji ber wê yekê navê wî bû Udîpus. Nehêlan ew di hembêza dayîka xwe de bijî, ew dane destê peyrewekî, da wî bibe û bavêje çolê, ku bibe xwarina ajal û lawiran.

Xwedê kir, ku şivanekî wingewing û qîjeqîja mindalê tazî û birçî bihîst, ew rakir û bi xwe re bire welatê xwe Korînth, ku padişahê wî Polybos û şahjina wî Meropê bê zarok bûn.

Udîpus di mala şahanî de mezin bû, û di pevçûneke lawikan de hate guhên wî, ku ew ne kurê padişahê Korinth e, ew ji aliyê malbata şahanî ve hatiye xwedîkirin, hema ew ji welatekî dî ye. Gava ew diçe ba cadobaza navdara Dêlfî, cadobaz ji wî re dibêje, ku ewê bavê xwe bikuje û dayîka xwe li xwe marbike. Udîpus wekî mirovekî şêt bi çolan dikeve,

xwe bi xwe rêwinda dike, da nizanibe ew ku ve diçe û di kijan welatî re derdikeve.

Paş gereke mezin û fireh, Udîpus tê bajêrê Têbê. Di rê de, berî ku bigihe bajêr, pêrgî obeke mêrên çekdar tê, ku li pêş û paş mezinekî xwe ketibûn rê. Yekî ji wan deng li Udîpus kir û jê pirsiya, ka bo çi seriyê xwe ji mezinê wan re neçemand. Peyvek ji wî, yek ji Udîpus, rabûn bi hev çûn û Udîpus ew kuşt. Ewên dî hêriş ser wî kirin, da tola hevalê xwe hildin, hema nikanî bûn zora Udîpus bibin, wî giş kuştin, û bi ser ve jî mezinê wan, ku mêrekî navsalî û jar bû. Udîpus hîngê nizanî bû, ku ew padişahê Têbê Layos bû. Layos bavê rastîn ê Udîpus bû.

Berî wê bi demekê, dêwekî pir bi hêz, ku bi Sifînîks dihate navkirin, di dergahê bajêrê Têbê de, rê girtibû û nedihêla kesek bê dayîna qurbaniyekê di ber wî re derbas bibe. Nîvê wî dêwî bazekî bi basikên mezin bû û nîvê dî jî şêrek bû. Ew dota Tîfon û Eşîdna bû. Eşîdna bi terzê marekî tofan ê gelek bi girs û hêzdar bû û xanga segê dojehî Kêrbêros bû, ewê ku ji pişta Heyderê Lêrna û agiravêja navdar Şîmêra bû. Sifînîks li ser zinarekî palda bû, kî di ber wî re dihat jê pirsek dikir, gava yekî bersîva wê pirsê dizanî, Sifînîks dihêla bersîvdar derbas bibe nav bajêr, lê gava nedizanî bersîv çiye, bi wî digirt, ew kerker dikir û davête devê xwe. Ev dêw bûbû belayeke mezin a ku bi ser rûniştvanên Têbê de hatibû, çare jê re tune bû.

Paş ku padişahê bajêrê Têbê Layos bi destê Udîpus hate kuştin, birayê jina padişah, ku bi navê Kirêon bû, deselatî stand û ciyê xwe di nav gelê Têbê de wekî padişah bir, lê ji ber ku Sifînîks pirsek ji kurê wî jî kiri bû û kurê wî bersîva dêw neda bû, ew jî wekî gelek ciwanên Têbê hatibû kuştin û xwardin. Dilê Kirêon ji deselatdariyê sar bû, û fermanek li nav bajêr û li derdora bajêr da belavkirinê, ku kî dêw bikuje, wê bibe padişah û wê xanga wî Jokastê li xwe mar bike.

Di wê navê de, Udîpus giha bû dergahên bajêrê Têbê, wekî dixuya, qedera wî ew gihande wir, bê ku bizane çi di rêya wî de heye û çi wê bi seriyê wî bê. Hema wî ji xwe re delîveyeka mirinê di wê fermanê de dît, ji ber ku dilê wî her xemgîn bû, ji tirsa ku qedera wî rast wî bi ser kuştina bavê wî de bi ser markirina dayîka wî de bibe. Wî tew nizanî bû, ku berî wê bi kurtedemekê, di rêya Têbê de, bavê xwe bi destê xwe kuştiye û parek ji pêşnasîna cadobaza Dêlfî, ku ji wî re gotibû, bi cîh hatiye. Udîpus

di dilê xwe de hîvî dikir, ku Sifînîks wî dikuje û parçeyên wî li pey hev davêje devê xwe, ew bi wê şêweyê ji jîna xwe ya bê eger rizgar dibe.

Udîpus çû milê xwe da zinarê ku Sifînîks li ser daniştiye, û bi seriyê çovê xwe li zinarê da. Sifînîks dît ku dûrwelatiyek hatiye û qerezê ji wî dike. Paş ku piçekî hizirî, got:

„Çiye, ewê ku bi beyanî re li ser çar lingan e, nîvro li ser du lingan e û bi êvarê re li ser sê lingane? Ew bi livandina çar lingan jartir e ji livandina du lingan.“

„Mirov e“. Udîpus wilo got û berken bû, ji ber ku bersîva pirsê gelek asan bû. „Mirov di zarotiya xwe de, li ser du destan û du lingan dilive. Gava piçekî mezin dibe ew li ser du lingan digere, lê gava pîr dibe bi herdu lingan û çoyekî digere.“

Dema Dêw ev bersiv bihîstiye, ji xeyda dilê xwe û ji ber ku li pirsa xwe ya asan poşman bû, gerdon di dora serî re geriya, dest û kab lê sist bûn, û ji ser zinarê ve hate xarê. Udîpus şûrê xwe ji ber nava kişand û da histoyê Sifînîks û ew kuşt.

Ji ber zanîn û kanîna Udîpus di paqijkirina dergahê bajêrê Têbê de, gelê bajêr ew ji xwe re kir padişah û jina padişahê kuştî li wî mar kirin, hema kesekî nedizanî, ku ew jin, Yokastê bû, ew dayîka Udîpus bû.

Xwedê çar zarok ji Yokastê dane Udîpusê tew nedizanî ku zarokên wî xang û birayêd wî ne. Navê zarokan jî wilo bûn: Birayê mezin Etêoklês, û yê piçûk Polînaykês, xanga mezin jî Antîgonê û ya piçûk Ismênê.
Sal hatin û derbas bûn, û gelek nexweşî li pey hev pêda bûn, di serî de pirka reş û wêran, bi ser ve jî bad û bahozên gelek xort, lehî û û hêrişa kulî û maran…

Gelê Têbê şandiyên xwe şandin ba cadobaza Dêlfî, ku egerên van xişim û ziyanên mezin, ku bi ser wan de hatîne, binasin. Cadobaza Dêlfî ji wan xwest, ku kuşterê padişahê xwe Layos binasin û wî tawanbar bikin. Udîpus hîngê li xwe hişyar bû, ku wî ew padişah di rê de kuştibû. Bi ser ve jî, ew têgiha rastiya xwe, ew rastiya ku ji wî ve nediyar bû, û lew re seriyê xwe rakiribû û ji ber qedera xwe direviya, nedizanî ku ve diçe. Ew têgiha ku wî dayîka xwe li xwe markiriye û zarokêd wî ji dayîka wî ne. Di vir de jin bûye dayîk û dayîk bûye jin, ma kî dikane xwe li ber vê yekê bigire. Udîpus bi du derziyên dirêjên fistanê dayîk-jina xwe herdu çavêd

xwe kûr dike, û zarokên wî li wî tên hev, wî didin ber xwe û ji nav bajêr qorî dikin, hema dota wî Antîgonê, ya ku pir ji bavê xwe hezdikir, çoyekî dide destê wî û bi wî re diçe, jê re parsê li nav gundan dike, da ew ji nêza re nemire.